Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :463 nameronahi@gmail.com 8-Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Heta vegera Efrînê, berxwedana wê dewam bike

**Welatiyên Efrînê ku ji ber êrîşên dewleta dagirker neçar ji Efrînê derkevin û li herêma Şehbayê bi cih bibin, di nava şert û mercên zehmet de berxwedana xwe berdewam dikin. Heta niha saziyên mirovî yên navnetewî alîkariya wan nekirine. Welatiyên li Kampa Berxwedan bi cih bûne dan zanîn ku ew ê heta rizgarkirina Efrînê berxwedana xwe di bin hemû şertan de dewam bikin.**





Welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk ku li herêma Şehbayê bi cih bûne berxwedana xwe dewam dikin. Welatiyên ku li Kampa Berxwedanê bi cih bûne diyar kirin ku heta ew vegerin Efrînê ew ê berxwedana xwe berdewam bikin. Welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dagirkeriya dew-




leta Tirk ji Efrînê derketin û li Şehbayê bi cih bûne di nava şert û mercên jiyanê yên zehmet de berxwedana xwe dewam dikin. Rêxistinên mirovî jî alîkariyê nadin welatiyên Efrînê yên ku koçber bûne.
Di Kampa Berxwedan de zêdetirî 742 kon hene. Di kampê de2 hezar û 865 dijîn. Şêniyên kampê soza berdewamkirina berxwedanê heta rizgarkirina Efrînê û vegera malên xwe dan.
Kampa Berxwedan ku dikeve bakurê navçeya Fafînê, yekem kamp e ku li kantona Şehbayê ji aliyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ve hate vekirin.
Bi derfetên xwe yên heyî Rêveberiya Xweser dest bi rastkirina zemîna kampê kir. Piştre kon vedan û şênî lê bi cih kirin. Paşê gelek sazî wekî Desteya Çand û Hunerê, Yekitiya Ciwanên Rojava, Meclisa Malbatên Şehîdan, desteyên çandinî û tenduristiyê û hwd. xwe di nav kampê de bi rêxistin kirin.
Bi pişgtgiriya Rêveberiya Xweser meclis xebatên xizmetguzariyê pêşkêş dikin. Her wiha şaredariyê 2 sûkên gelêrî di kampê de ji bo peydekirina pêdiviyên şêniyan ava kirin. Ji bo zarokan jî dibistan û park hatin vekirin.
Têkildarî mijarê Endamê Rêveber ê Kampa Berxwedan Şêxo Ibrahîm axivî û diyar kir ku di dema belavkirina alîkariyan de gelek zehmetî kişandine û da zanîn ji ber dorpêça li ser herêmê ji çar aliyan ve bi derfetên xwe û bi desteka welatiyên herêma Cizîrê, alîkarî pêşkêş kirine.
Heyva Sor a Kurd hewl dide alîkariyên tenduristiyê bide welatiyan. Lê hin rewşên nexweşiyan hêza wan derbas dikin. Ji ber nepeydabûna alavên tenduristiyê û tunebûna dermanên pêwîst Heyva Sor a Kurd zehmetiyan dikişîne. Di encamê de gelek nexweşî di nav kampê de belav dibin. Eger rewşa nexweşekî xeternak be navenda Heyva Sor neçar dimîne wan nexweşan derbasî derveyî herêmê bike. Lê ji ber dorpêça ku ji çar aliyan ve li ser herêmê hatiye ferzkirin, hin caran nexweş nikarin derbas bibin û di encamê de jiyana xwe ji dest didin.
Welatiyê bi navê Hebîb Omer ku li Kampa Berxwedan bi cih bûye, destnîşan kir ku piştî hatine kampê, jiyana xwe bi awayekî komînal bi rêya komîn û meclisan bi rêxistin kirine û wiha dewam kir: "Ji destpêka avakirina kampê û heta îro Rêveberiya Xweser bi derfetên xwe û di nav dorpêçê de alîkariyê pêşkêşî kampê dike."
Omer wiha berdewam kir: "Tevî şert û mercên dijwar ên jiyanê li kampê û kêm derfetên xedemî û tenduristiyê, lê berxwedana ku me li Efrînê dest pê pêkiribû, heta rizgarkirina bajarê xwe ji çeteyan, em ê berdewam bikin."
Welatiyê bi navê Cemîl Reşîd ev tişt anî ziman: "Nêzî 7 meh e em li vir in û heta niha tu rêxistineke mirovî alîkarî pêşkêşî me nekiriye. Tenê rêveberiya kampê û meclis bi desteka Rêveberiya Xweseriya Demokratîk alîkariyê li welatiyan belav dikin."
Reşîd destnîşan kir ku cîhan li hember welatiyên Efrînê bê deng e û rewşa wan paşguh kirine û da zanîn ku ev rewşa Efrînê jî berdewam kirina komploya navnetewî ye. Reşîd wiha got: "Ji destpêkê ve û heta niha em dest ji berxwedana ku me bi rihê Avesta û Barînê dest pê kiribû bernadin û heta pêkanîna hemû armancên xwe û armancên şehîdên azadiyê û heta ku em di bin alên serkeftinê de vegerin Efrînê berxwedana me wê berdewam bike."...*ANHA*





## Temenê faşîzma AKP'ê hindik maye

Hevserokatiya Konseya Rêvebir a KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bal kişand li ser şerê AKP'ê yê li dijî gelê Kurd. Faşîzma AKP-MHP'ê her roj bi şerê taybet û derewên psîkolojîk hewl dide emrê xwe dirêj bike lê divê bizanibe ku temenê wê hindik maye. KCK'ê diyar kir ku artêşa Tirk li beramberî gerîla têk çûye û gerîlayên ku 4'ê Cotmehê li Êlihê çalakî pêk anîn jî pîroz kir. ***R-4***



## Şehîdên serhildanê hiştin ku berxwedan bi ser bikeve



Di 6-7-8'ê Cotemeha sala 2014'an bi ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê li seranserî bakurê Kurdistanê û Tirkiyê gel rabû serhildanê û di encama êrîşên hêzên faşîst yên Tirk de. zêdeyî 50 kes şehîd bûn. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê bi daxuyaniyekê salvegera serhildanên 6-8'ê Cotmehê bi bîr anî û diyar kir ku van serhilandan hişt ku DAIŞ li Kobanê têk biçe. ***R-4***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 463 8- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# LI DU ENIYAN ŞER GIRAN BUYE

Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê berdewam dike. Di navbera şervanên QSD'ê û çeteyên DAIŞ'ê de şer û pevçûnên giran rû didin. Balafirên Koalîsyona Navnetewî jî piştgiriya hewayî didin pêngavê. Şervanên QSD'ê ber bi bajaroka Hecînê ve pêş de diçin.



Niha li eniyên Baxoz û Hecînê şer giran buye. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bîlançoya şerê 24 saetên dawî eşkere kir. QSD'ê ragihand ku di 24 saetên dawî de li her du eniyan 29 çete hatine kuştin. QSD'ê diyar kir ku şervanên wan gelek êrîşên çeteyan vala derxistine û dest danîne li ser hêjmareke zêde cebilxaneyên wan. ***R-2***

## Armanca komployê kûrkirina krîza Rojhilata Navîn bû



Bi boneya salvegera 20'emîn ya komploya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêberê GelêKurd Abdullah Ocalan Meclîsa Kantona Efrînê ya li daxuyaniyek da û komplo şermezar kir. Meclîsê diyar kir ku heta Efrînê were rizgarkirin û Rêber Ocalan azad bibe ew ê têkoşîna xwe bê navber berdewam bikin. ***R-5***

## Divê ol ji destên desthilatdaran derkeve



Bi dirûşmeya "Bi perspektîfa îslama demokratîk ber bi avakirina civaka exlaqî û polîtîk ve" Komîteya Civak û Baweriyan a Bakurê Sûriyê civîneke berfireh li bajarê Tebqayê lidarxist. hêjmareke zêde oldar, şêx û rûsipiyên herêmê beşdar bûn. Di civînê de girîngiya rizgarkirina olê ji desthiladaran hat ziman. ***R-6***

## MŞD'ê banga tevlîbûna çalakiyan kir




Meclîsa Şengalê ya Derveyî welat têkildarî salvegera Komploya 9'ê Cotmehê daxuyaniyeke nivîskî Komploya 9'ê Cotmehê şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyan li hemû kesan kir. MŞD'ê wiha got, "Li girava Îmralî tecrîdeke dijmirovahiyê li dijî Rêber Apo heye. Ji bo şikandina tecrîdê em bang li tevayî Kurdistanî, gelê Êzidî û dostan dikin ku beşdarî çalakiyan bibin." ***R-5***

## 73 komînên jin hatin avakirin

Li Bakurê Sûriyê avakirina komînan û bi taybet komînên jinan berdewam dike. Jin li dora van komînan tên cem hev û bi rêya van komînan dibin xwedî rol. Kongreya Star a navçeya Til Hemîsê ya Herêma Cizîrê di meha Îlonê de bi armanca çalak kirina rola jinan 73 komîn li gundewarên navçeyê, vekirin. ***R-3***



## Di Konferansa Jinan a Navneteweyî de tecrubeya Rojava hate nîqaşkirin





Konferansa Jinan a Navneteweyî ya ku li bajarê Frankfûrtê ya Elmanyayê hat lidarxistin. Ji her çar aliyên cîhanê jin tevlî konferansê bûn û biryardariya têkoşîna hevpar a bi jinên Kurd re anîn ziman. Her wiha di konferansê de li ser tecrubeya Rojava hate sekinandin. ***R-2***

## Kongreya Star li dijî tecrîdê banga serhildanê kir

Koordînasyona Giştî ya Kongreya Star bi daxuyaniyekê Komploya Navdewletî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tecrîdkirina wî şermezar kir. Kongreya Star diyar kir ku ew ê têkoşîna xwe li ser fikrên Rêber Ocalan berdewam bikin û bang li jinan kir ku li dijî tecrîdê têkoşînê rabin. ***R-2***



## Deste wê xizmeta civakê bikin



Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdilhamid El-Mehbaş diyar kir ku avakirina desteyên rêveberiya xweser gaveke girîng bû da zanîn ku ew deste wê xizmeta civakê bikin. Her wiha El Mehbaş destnîşan kir ku ew ê her dem bi MSD'ê re di nava têkiliyê de bin. ***R-4***

## Dagirkeran 3 bira revandin

Dagirker li Efrînê li dijî welatiyên kiryarên mîna kuştin, talan, revandin û hwd, berdewam dikin. Niha jî welatiyên ku zeytûn û hinarên xwe kom dikin dagirer ji wan distînin û didizin. Herî dawî jî hat ragihandin dagirkeran ji gundê Kurzêlê yê navçeya Şêrawa 3 bira revandine û nayê zanîn bê ka bi kûde birine. ***R-2***

## HPG'ê li Hatayê li artêşa Tirk xist

Li bakurê Kudistanê çalakiyên gêrîlayên HPG'ê yên li dijî artêşa Tirk berdewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku li bajarê Hatayê hêzên wan li dijî yekîneyeke operasyonê çalakî lidarxsitine û di encama çalakiyê de leşkerekî Tir hatiye kuştin. ***R-2***

## Li Endonezyayê hêjmara miriyan gihişt 1700 kes

Li gorî bîlançoya fermî ya erdhej û tsûnamiya 28'ê Îlonê ya li girava Sûlawesî ya Endonezyayê nêzî 1700 kes mirin û zêdetirî hezar kes jî winda ne. Nexweşxane tijî bûne û pêdiviyên tedawiyê jî kêm in. Netewên Yekbûyî roja Înê daxuyanî da û ragihand ku ji bo xebatên alîkariyê plana 50.5 mîlyar dolar xistine dewrê. ***R-5***

# Li du eniyan 29 çete hatin kuştin

**Qonaxa Dawî a Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê berdewam dike. Şervan li eniyên Baxozê û Hecînê bi pêşde diçin. QSD'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di şerê 24 saetên dawî de li van her du eniyan 29 çete hatine kuştin.**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bîlançoya şerê 24 saetên dawî yê Qonaxa Dawî a Şerê Tunekirina Terorê bi daxuyaniyekê eşkere kir. Di daxuyaniyê de hate diyar kirin ku 29 çeteyên DAIŞ`ê hatine kuştin û şervanên QSD`ê ji gelek aliyan ve bi pêşde diçin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê bi daxuyaniyekê ku li ser malpera xwe ya fermî weşand bîlançoya şerê 24 saetên dawî eşkere kir.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin:

### ENIYA BAXOZ

"Di navbera şervanên me û terorîstên DAIŞ`ê de şerê giran rû da. Şer çend saetan dewam kir. Di wî şerî de terorîstan hemû cûreyên çekan bikar anîn da ku xwe ji derbeyên şervanan me biparêzin.
Tevî dijwariya şer lê şervanên me 1,5 kîlometre bi pêşde çûn, 15 nuqteyên xwe ava kirin.
Her wiha balafirên Koalîsyona Navnetewî baregehên terorîstan kir hedef. Di encama wê de du terorîst hatin kuştin û baregeha avêtina mûşekên "herarî" hate rûxandin.
Her wiha balafiran erebeyeke bombebarkirî ku çeteyan hewl didan bi rêya wê derbasî baregehên şervanan bibin, rûxandin.
Di saetên dawiya şevê de şervanên me li hemberî bargehên çeteyan ên li gundê El-Meraşde çalakî lidar xistin. Li wê derê depoyeke cebilxaneyê hate rûxandin û şervan 1 kîlometre bi pêşde çûn.
Li hemû nuqteyên wî alî şerên dijwar rû didin.

### ENIYA HECIN

Li wê derê şerê dijwar derket.
Di encama wê de hejmarek ji terorîstan hatin kuştin lê hejmar nehat naskirin. Terorîstan hewl dan ku êrîşî şervanan bikin lê şervanan bersiv dan û terorîst neçar kirin ku paşde vegerin.
Li wê derê şerê demkî derdikevin.
Terorîst li wê derê çekên giran û moşekên herarê bikar tînin.
- Bîlançoya şer:
-29 terorîst hatin kuştin.
-Baregeheke avêtina moşekên herarî, erebeyeke bombebarkirî, 3 baregehên terorîstan, kargeha çêkirina erebeyên mayînkirî û depoyeke cebilxaneyê hatin rûxandin.
-Çekek doçka (12,5), 26 hezar guleyên wê, 25 hezar guleyên çeka BKC, 4 topbavêjin(120), 200 topên wê, 100 heşweyên hawanê, 5 hezar guleyên klaşnîkov, 2 sebetanên doçka (23), 10 sebetanên doçka (14,5), sebetaneke doçka (12,5).
-5 mayîn hatin bêbandorkirin.
-Balafirên Koalîsyona Navneteweyî 14 êrîş pêk anîn.

## HPG'ê li Hatayê li artêşa Tirk xist



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê operasyona Mêrdînê, çalakiya li Hatayê û êrîşa hewayî ya bi ser Avaşînê de daxuyanî da.
HPG'ê ragihand li Mêrdînê gerîlayek şehîd bûye, Ferdî Muslu ku beriya niha hatibû gotin şehîd bûye, 'birîndar bûye û dîl ketiye destê dijmin''.
Daxuyaniya di malpera HPG'ê de wiha ye:
''Şeva 5'ê Îlonê artêşa TC'ê ya dagirker bi beşdarbûna kontra û cerdevanan li herêma Bagok a Mêrdinê operasyoneke berfireh da destpêkirin. Roja 6'ê Îlonê leşkerên dagirker bi hêzên me re hatin beramberî hev, nekarin şer bikin û bi balafirên şer herêm bi giranî zêde bombebaran kirin. Di bombebaranê de hevalê me Şoreşger Mardîn şehîd bû.
Roja 2'yê Cotmehê artêşa Tirk a dagirker di navbera Hatay û Skenderûnê de li gelek qadan operasyonek bi tevlêbûna gelek yekîneyên kontra da destpêkirin. 4'ê Cotmehê gerîlayên me saet 12.00'an li nêzî girê Şahîn, li dijî yekîneyên operasyonê, ku kiribûn bin kontrala xwe çalakî kirin. Ji nêz ve derb li yekîneya dijmin hatiye xistin û 1 leşker hatiye kuştin.
Di daxuyaniya xwe de ya bi dîroka 4'ê Cotmeha 2018'an me bi raya giştî re par ve kiribû û gotibû, artêşa TC'ê ya dagirker 28'ê Îlonê li qada Pirdûda ya herêma Faraşînê ya Êlkê ya Şirnexê operasyon daye destpêkirin, di şer hevalê me Çekdar Azad (Ferdî Muslu) şehîd bûye. Di şer de hevalê me Çekdar şehîd nebûye, birîndar bûye û dîl ketiye destê dijmin.6'ê Cotmehê di navbeyna saet 21.00'an û 21.30'î de balafirên şer tên artêşa TC'ê ya dagirker qada Adilbeg a herêma Avaşînê bi balafirên şer bombebaran kiriye."

## Li Kobanê balafira keşfê ya artêşa Tirk ket destê YPG'ê




YPG`ê diyar kir ku li Kobanê balafireke bêmirov a keşfê ya girêdayî artêşa Tirk dagirker ket xwarê û kete destê hêzên wan.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG`ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker ji destpêka şoreşa Rojava heya niha li ser sînorên Rojavayê Kurdistanê gelê sivîl û hêzên wan hertim kiriye hedef û hewldanên xwe yên tehrîkwarî û bi tacîzan her berdewam kiriye û binpêkirina sînoran berdewam dike.
YPG`ê da zanîn ku herî dawî di şeva 6'ê Cotmehê saet di 18:00'an de balafirek bêmirov a keşfê (Drona bi kamîra a bi termal) xera bûye ketiye herêma wan û ketiye destê wan.

## Dagirkeran 3 bira revandin



Çeteyên girêdayî artêşa Tirk a dagirker 3 bira ku yek ji wan muxtarê gundê Kurzêlê yê navçeya Şêrewa ya Efrînê ye, ber bi cihekî nediyar ve revandin. Çarenûsa 20 welatiyên gund ku ev 4 meh e ji aliyê çeteyên Ehrar El-Şamê ve hatine revandin, hê jî ne diyar e.
Piraniya welatiyên ku ji aliyê çeteyan ve hatine revandin ji xizmên wan fidye dixwazin da ku serbest berdin. Artêşa Tirk û çeteyên girêdayî wê bi van destdirêjiyên xwe hewl didin welatiyên Kurd ên li Efrînê koçber bikin û demografyaya herêmê bi temamî biguherînin.
Herî dawî çeteyên girêdayî artêşa Tirk 3 bira ji gundê Kurzêlê yê navçeya Şêrewa ber bi cihekî nediyar ve revandine. Li gorî çavkaniyeke pêbawer ragihand ku navên her sê birayên hatine revandin wiha ne: Salih Osman, Ehmed Osman û mixtarê gund Fewzî Osman.
Çete her wiha zextê li malbata Salih Mehmûd dikin ku 800 hezar lîreyên Sûriyê bidin.
Piştî ku welatiyan hilberîna xwe ya hinaran wergirt, çeteyan dest danî ser hilberîna welatiyan û hilberîna wan dizî.
Heman çavkanî diyar kir ku 20 welatiyên gundê Kurzêlê ku ev nêzî 4 meh e ji aliyê çeteyên Ehrar El-Şamê ve hatine revandin, hê jî çarenûsa wan ne diyar e…*ANHA*

## Jinan li dijî tecrîdê banga serhildanê kirin

Koordînasyona Giştî ya Kongreya Star bi daxuyaniyekê Komploya Navdewletî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tecrîdkirina wî şermezar kir û bang li jinan kir ku ji bo azadkirina Ocalan serî hildin.
Girêdayî tecrîda li ser Rêber Ocalan Koordînasyona Giştî ya Kongreya Star bi daxuyaniyekê bang li jinan kir ku li hemberî dagirkeriya Tirkiyê serî hildin.
Daxuyaniya Kongreya Star wiha ye:
"Em wek tevgera jinan li Rojava komploya navdewletî ya li dijî rêberê me û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tundî şermezar dikin. Fikr û felsefeya Ocalan wê pirsgirêkên Rojhilatanavîn çareser bike.
Bi saya fikra Ocalan niha gelên Bakurê Sûriyê hevgirtina xwe xurt kiriye û azad dijîn. Mînaka ku niha li Rojava tê meşandin nimûneya jiyana hevbeş û aramiyê li Rojhilata Navîn e. Gelên herêmê êdî fikra Ocalan nas kiriye û wek çareserî û hêviya azadiyê ji bo xwe dibînin.
Ev çend sal e rêber Ocalan di bin tecrîdeke giran de ye û agahiyên me derbarê tenduristiya wî de tune ne.
Em bang li hêzên demokrasîxwaz û azadîxwaz û bi taybet jinan dikin ku di salvegera 20'emîn a Komploya Navdewletî ya li dijî rêber Ocalan de li dijî faşîzma Tirkiyê û hevkarên wê serî hildin.
Em wek endamên Kongreya Star soz didin ku em ê têkoşîna xwe li ser fikra azad a rêber Ocalan berdewam bikin."




## Di Konferansa Jinan a Navneteweyî de tecrubeya Rojava hate nîqaşkirin

Konferansa Jinan a Navneteweyî ya ku li bajarê Frankfûrtê ya Elmanyayê hat lidarxistin li ser tecrubeya Rojava hate sekinandin.
Ji her çar aliyên cîhanê jin tevlî konferansê bûn û biryardariya têkoşîna hevpar a bi jinên Kurd re diyarkirin.
Berdevka Kongreya Star Evîn Swêd ku tevlî konferansê bû diyar kir ku jinên Kurd ji bo azadî û nasnameya xwe têdikoşin û bal kişand ser binpêkirinên li ser jinan.
Swed diyar kir ku li Rojava jin xwe bi rêve dibin û jin di hemû qadan de rola xwe bi cih tînin.
Hevseroka Konseya Rêvebir a Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif jî têkildarî awayê rêxistinkirina jinan a li Rojava agahî da. Yûsif diyar kir ku. Di hemû xebatan de pergala xweser a jinan jî heye.







# Bi hunerên xwe piştigirî dan rizgarkirina Efrînê

**Tevgera Çand û Hunerê ya Efrînê bi rêya pêşkêşkirina berhemên xwe yên hunerî piştigirî dan berxwedana serdemê ya gelê Efrînê. Piştî ku Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat lidarxistin, Tevgera Çand û Hunerê jî lez da xebatên xwe û 8 rojan çalakiyên hunerî ji gel re pêşkêş kirin.**



Tevgera Çand û Hunerê bi rêya pêşkêşkirina berhemên xwe yên hunerî berxwedana gelê Efrînê ya li dijî dagirkeriya dewleta Tirk nîşan da.
Piştî bi dawîbûna Konferansa Rizgarkirina Efrînê ya ku di 18`ê Hezîranê de hatibû lidarxistin, Tevgera Çand û Hunerê xebat û çalakiyên xwe xurttir kirin. Di 26`ê Îlonê de li deverên Şehbayê 8 rojan berhemên xwe yên hunerî pêşkêş kirin. Bi rêya berhemên xwe berxwedana şêniyên Efrînê, israra rizgarkirina Efrînê, êrîş û kiryarên dagirkerên Tirk û çeteyên girêdayî wê li dijî welatiyên Efrînê vegotin.
Yek ji komên ku hunerên xwe di hefteya çandî de pêşkêş kirin jî Koma Rojava ye. Koma Rojava ji 9 endaman pêk tê. Komê tabloyeke hunerî têkildarî rewşa Efrînê beriya êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê pêşkêş kir. Strana yekemîn girêdayî projeya neteweya demokratîk bû. A duyemîn li ser bedewiya kantona Efrînê, xweşikiya xwezaya wê û dîroka Kurd li herêmê bû.
Girêdayî mijarê Endamê Rêveber ê Tevgera Çand û Hunerê Henan Seydo wiha got: "Bi rêya tabloya xwe me xwest nameyekê ji raya giştî re bişînin."
Komên stranan ku hejmara wan 5 bûn (Agirî, Şehîd Berçem, Çiyayê Mîra, Engîzek û hunermendên Efrînê) bi tevlêbûna 36 endaman di Hefteya Çandî de stranên gelêrî û şoreşgerî pêşkêş kirin. Her wiha gelek stranên gelêrî yên li ser dîroka Kurdan a kevanr hatin pêşkêşkirin.
3 komên govendê yên girêdayî Tevgera Çand û Hunerê tev li çalakiyên Hefteya Çandî bûn. Hejmara endamên her sê koman 35 bûn. Gelek govendên kevn pêşkêş kirin.
Endamê Rêveber yê beşa govendê ya girêdayî Tevgera Çand û Hunerê Demhat Xilo wiha axivî: "Di dirêjahiya bi hezaran salan de dijmin xaka me dagir kir, çand û govendên me dizîne û îdia kirin ku ev govend ên wan in. Lê em xwediyên rasteqîn ên van govendan in."
Her wiha Koma Afirînerên Hêviyê bi şanoyên xwe beşdarî çalakiyên Hefteya Çandî bû. Kom ji 5 endaman pêk tê. Komê 3 şanoyên sembolîk lê bi şêwazeke nû pêşkêş kirin. Şanoya yekem girêdayî dîroka gelê Kurd bû. Her du şanoyên din girêdayî sozdariyê û dilsoziyê bûn.
Endama Rêveber a Beşa Şanoyê ya girêdayî Tevgera Kevana Zêrîn Zeyneb Mihemed wiha got: "Bi rêya her sê şanoyan me xwest nameyekê ji civakê re bişînin ku dijminên gelê Kurd pir in û divê em baldar bin."
Zeyneb destnîşan kir ku armanca wan ew e ku hizirên şanoyê bi awayekî sembolîk bigihînin civakê…*ANHA*

## Yekîtiya ziman wê rê li ber yekîtiya neteweyî veke



Nivîskar Qendîl Şêzbizînî yê pirtûka wî ya bi navê "Hezar û Yek Peyv" ji Weşanxaneya Sîtavê derket diyar kir ku xebatên serbixwe yên zimanzanên kurd zirarê dide zimanê kurdî û got: "Sazkirina yekitiya ziman wê rê li ber yekîtiya neteweyî veke."
Pirtûka "Hezar û Yek Peyv" a nivîskar Qendîl Şêzbizînî ku bi naveroka li ser rêziman û ferhenga zimanê amade kiriye ji Weşanxaneya Sîtavê derket. Nivîskar Şêxbizînî ji Hewlêrê ye û Serokê Navenda Çanda Roj û Berdevkê Organîzasyona Roj Medê ya Hewlêrê ye. Şexbizînî li ser yekîtiya neteweyî û ziman axivî.
Şêxbizînî behsa armanca ferhengê kir û got: "Armanca min a li ser xebitîna zimanê kurdî ew bû ku ez zaravayên wan nêzî hev bikim."
Şêxbizînî anî ziman ku ew li ser zimanê kurdî lêkolînan dike û armanca wî ew e xebatên xwe bêtir li ser zimanê kurdî yê berê birêve bibe û got: "Min zimanê kurdî veqetand sê beşan. Yek zimanê kevn, yek jê jî zimanê navberê û yek jê jî zimanê nûjen e. Zimanê berê dibêjin Medî. Ji yê navberê re dibêjin Pehlewanî ye û herêma Hewramî jê re dibêje Palî. Zimanê niha jî Kurmancî, Soranî, Kirmanckî, Kelhorî, Hewremanî ye. Ji van bênc zaravayan pêk tê."
Şêxbizînî pêk nehatina yekîtiya zimanê kurdî jî nirxand û got: "Her tim mijara nîqaşê ye. Sedemê vê jî ew e ku zimanê kurdî pirr zaravayî ne. Her parçeyek Kurdistan bi zaravayek diaxive. Hem zextên rêveberiya wan dewletan û hem jî ji ber sînor di navbera wan de hatine dayîn kurd nikarin yekîtiya zimanê xwe ava bikin. Astengiya herî mezin jî ew e ku veqetandina zaravayan e. Ji hev dûr dimînin."
Şêxbizînî da zanîn ku pêdiviya kurdî bi standartbûnê heye û wiha got: "Yekîtî ango em bêjin standartiya navbera zimanê kurdî pirr girîng e. Divê ku ji bo zaravayên kurdî bigîhîjin hev û standartiyek ziman bê sazkirin, hemû zimanzanê kurd li hev kom bibin û xebatan bidin destpêkirin. Lê heke ev nebe wê her aliyek û zaravayê xwe bide ferzkirin."

### YEKITIYA ZIMAN DÊ RÊ LI BER YEKÎTIYÊ VEKE

Şêxbizînî diyar kir ku xebatên serbixwe yên zimanzanên kurd zirarê dide zimanê kurdî û got: "Sazkirina yekitiya ziman dê rê li ber yekîtiya neteweyî veke."…*MA*

## Li Kobanê şevbêrk hat lidarxistin



Bi armanca ku wêje û hezkirina çîrokan li gel welatiyan ava bikin şevbêrkek li navenda Çand û Hûnerê ya Baqî Xido hate lidarxistin.
Yekitiya Rewşenbîrên kantona Kobanê şevbêrkeke çîrokan li navenda Çand û Hûnerê ya Baqî Xido li dar xist.
Bi dehan endamên saziyan, welatiyên Kobanê û hejmarek çîrovkan tev li şevbêrka çîrokan bûn.
Di şevbêrkê de Endama Komîteya Wêje ya Serêkaniyê Nerîman Evdik çîrokek li ser şervanekî û çîrokek jî li ser jineke berxwedêr vegot.
Mamosteyê Wêjeya Kurdî Mazlûm Cimo jî çîrokek li ser şer û yek jî li ser rewşa civakê xwend. Mamost Aras Hiso jî çîroka bi navê "Efrîn ji dayik bûye" xwend…*ANHA*

## Li başûr li dijî tecrîdê pêşengeh tên vekirin

Bi minasebeta 20'emîn salvegera kompoloya navnetewî ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatibû destpêkirin, wê li Silêmanî û navçeyên wê pêşengehên wêneyên Ocalan bên vekirin.
Pêşengeh, ji aliyê Saziya Çand û Hunerê ya Nuger ve bi dirûşmeya "Rêbertiya azad wêneyê azadiyê nîşan dide" hatiye organîzekirin. Ji bo pêşengehê 5 wênesazan bi giştî 22 wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çêkirine.
Pêşangeh wê di navbera 8 û 15'yê Cotmehê de li Silêmanî, Kelar, Kifrî û Ranya bê vekirin. Li gorî agahiyên ku rêveberên Saziya Nûger dane, pêşengeh wê destpêkê li Silêmaniyê bi daxuyaniyekê bê destpêkirin û 2 rojan bidome, piştre jî li navçeyên din bê vekirin…
*ROJNEWS*





## Hilbijartinên Şahredariyan li Beljîka

Derwêş M. FERHO

Kurd ji salên 1960 û vir de bi awayekî girseyî li Beljîka hene. Di destpêkê de mîna karkerên bîrên komirê, xaniyan, lêkirina rê û bexçeyên, paqijiya dezgehên fermî ji xwe re jiyanek nuh ava dikirin. Paş salên 1980 jî penaber, ji Bakur, Başûr, Rojhilat û di van demên dawîn de jî Rojava, kom bi kom û di demên cuda de hatin. Hejmareke zelal nîne, lê hinek derdor behsa 60-70 hezar, hinek derdor jî behsa 100 hezar Kurd dikin. Mixabin, heta niha jî Kurd nebûne xwedî roleke girîng di siyaset û meydana kultûrî de. Sedemên vê cuda ne û mijara me ya îro ne şîroveya vê yekê ye. Îro emê li ser rewşa partiyên siyasî li Beljîka û hebûna namzedên Turkan biaxivin.
Bi munasebeta hilbijartinên şahredariyan di 14ê Cotmehê 2018 de Enstituya Kurdî ya Brukselê mecbûr ma ku daxuyaniyek belav bike û balê bikşîne ser mijareke girîng. Namzedên Turk li ser lîsteyên partiyên cuda, çep, rast, Sosyal Demokrat, Xiristiyan Demokrat, Kesk û Lîberal. Ev daxuyanî bangek li van partiyan bû ku ew namzedên Turk li ser esasê îhtîram û pejirandina mafên merovan, gelan û demokrasî li Beljîka û Turkiyê were pêkanîn. Lê mixabin em dibînin ku li ser lîsteyên partiyên cuda, namzedên Turk hene ku di hember civak û raya giştî li Beljîka zimanekî, li hember civak û raya giştî ya Turkan bi zimanekî din diaxivin. Di daxuyaniyên xwe de behsa demokrasiyê û mafên merovan, di xwendegehan de mafê perwerdeya bi zimanê dayikê, ango bi Turkî dikin. Lê di çapemeniya Turkî û daxuyaniyên xwe de zimanekî nîjadparêz bikar tînin. Xwe wek dijminê kultûra rojava ku niha lê dijîn û nanê wê dixwin û li welatê xwe jî dijminahiya hebûna Kurdan û Ermeniyan dikin.
Li ser esasê xebatake ku ji aliyê çend saziyan tê meşandin, namzedên Turk li ser lîsteyên cuda di van rojên dawî de bûne sedema munaqeşeyên kûr.
Ji ber ku pirraniya van namzedan nîjaparêz in û di nava xwe de dijminê demokrasiyê û ramana azad in. Ji wan re berjewendiyên dewlata wan esasî ne û nabe were guhertin. Ew her tim mîna nûnerên dewleta xwe di nava şahredarî, parlemento, sazî, partiyên siyasî, sendîke û dezgehên perwerdê de cî digrin. Nasnameya wan ya Turkî, zimanê wan yê dayikê, ala wan, "xaka wan", û dînê wan (Îslama Selefî) di temamiya xebata wan de serdest e. Li ciyê ku ew lê ne, daxwaza wan ew e ku her kes û her merc îhtîrama hebûna wan di her alî de bigre. Lê ew li welatê xwe ramana azad, di xizmeta demokrasî û mafên merovan de bi xeter û dijmin dibînin.
Li vir jiyaneke pirrkultûrî, pirrzimanî, lê li Turkiyê daxwazên bi vî rengî wek xiyanet dibînin. Daxwaza wan di nava civaka Beljîka de perwerdeya bi zimanê dayikê ji bo civaka Turkî heye, lê ji bo dehan milyonan Kurd û Ermenî li Turkiyê planên dijminên welatê xwe dibînin. Ev namzedên Turk, zimanê ku rayedarên Turk li Turkiyê bi kar tînin, di nava civaka Turk de li vira jî bi kar tînin.
Enstituya Kurdî ya Brukselê li ser vê mijarê daxuyaniya xwe şande ji hemû partiyên siyasî ku dikevine hilbijartinên vê mehê. Daxwaz ew e ku ew vê durûtiya namzedên Turk bibînin û rastiyê piştguh nekin. Di vê navberê de di çend namzedên Kurd jî li ser lîsteyên partiyên siyasî cî girtin û li ser vê mijarê hişyar in. Hêvî ew e ku encamp baş be.

# Deste wê xizmeta civakê bikin

**Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdilhamid El-Mehbaş diyar kir ku avakirina desteyên rêveberiya xweser gaveke girîng bû da zanîn ku ew deste wê xizmeta civakê bikin. Her wiha El Mehbaş destnîşan kir ku ew ê her dem bi MSD'ê re di nava têkiliyê de bin.**

El-Mehbaş diyar kir ku avakirina desteyên Meclisa Rêveber ji bo destpêkirina xebatên Rêveberiya Xweser a ku xizmeta civakê armanc dike.

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdilhamid El-Mehbaş li ser xebatên meclisa rêveber û desteyên wê axivî.

El-Mehbaş diyar kir ku qonaxa girîng a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, avakirina desteyên girêdayî Meclisa Rêveber û hilbijartina hevserokên wan e da ku dest bi xizmete civakê bikin.

El-Mehbaş wiha dewam kir: "Bi armanca şêwiriyê û danîna projeyek xebatê ji bo qonaxa nû di rojên pêşiya me de em ê civîna yekemîn bi hemû desteyan re li dar bixin."

El-Mehbaş destnîşan kir ku Meclisa Rêveber; meclisek îdarî û xizmetguzarî ye û wiha dewam kir: "Di rastiyê de Meclisa Rêveber weke desteya rêveber a herî bilind a rêveberiyê tê destgirtin, ji ber wê em girîngî didin her du warên rêveberî û xizmetguzarî."

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyyê Ebdilhamid El-Mehbaş diyar kir ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê hertim bi Meclisa Sûriya Demokratîk re di nava têkiliyan de be, da ku hevkariyek di navbera xebatên meclisê û Rêveberiya Xweser de hebe…*ANHA*



# Temenê faşîzma AKP'ê hindik maye

Hevserokatiya Konseya Rêvebir a KCK'ê diyar kir faşîzma AKP-MHP'ê bi propagandaya şerê taybet dixwaze emrê xwe dirêj bike. KCK ji ber çalakiya li Êlihê ya li dijî artêşa Tirk hêzên gerîla pîroz kir.

Hevserokatiya Konseya Rêvebir a KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bal kişand li ser şerê AKP'ê yê li dijî gelê Kurd. KCK'ê pêvajoya şerê 24'ê Tîrmeha 2015'an heta roja îro nirxand û diyar kir AKP-MHP di aliyê siyasî, leşkerî, aborî û civakî de hildiweşe. KCK'ê diyar kir ku artêşa Tirk li beramberî gerîla têk çûye û gerîlayên ku 4'ê Cotmehê li Êlihê çalakî pêk anîn jî pîroz kir.

Daxuyaniya KCK'ê wiha didome; "Desthîlatdariya faşîst a AKP-MHP'ê ji 24'ê Tîrmeha 2015'an ve şer dijwar kiriye. Beşek girîng yê vê şerî jî weke şerê pîskolojîk bi rê ve dibe. Krîzên di aliyê siyasî, leşkerî, aborî û civakî de hê bêhtir desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê sewqî şerê psîkolojîk dike. Ji 15'ê Tebaxa 1984'an destpêkirina şerê gerîla re kîjan partî hatiye li ser hikm gotine em ê gerîla û PKK'ê biqedînin û propagandaya qedandinê kirine. Tûrgût Ozal gotibû 3 4 eşkiya ne, serokwezîrê şerê qirêj Tansû Çîller ê salên 1990'î her roj digot wê biqede, wê biqede. Piştî komploya li dijî Rêber Apo hemû rayedarên dewletê bi yek gotinê îlankirina ku PKK qediya. Tayyîp Erdogan ê ku hilbijartinên 2002'ê qezenç kirî piştre got hûn nefikirin pirsgirêka Kurd nîne, lê Tevgera Azadiya Kurd her sal di aliyê îdeolojî, leşkerî û siyasî der bê bêhtir mezin bû. Îro di pêvajoya Şerê 3'emîn ê Cîhanê de hêzeke ku hemû dengeyên siyasî bandor dike ye.



### DERBE LI DIJÎ GELÊ KURD HATE KIRIN

Derbeya faşîst a rastîn piştî hewldana darbeya 15'ê Tîrmehê, di 20'ê Tîrmehê de bi rewşa awarte re hate kirin. Tifaqa faşîst diyar dike ku ev darbe li dijî endamên Fethûllah hatine kirin lê di rastiyê de ev darbe li hêzên demokrasiyê û li têkoşîna azadiyê ya Kurdan hatiye kirin. Bi demê re derketiye holê ku, ev darbe li gelê Kurd û hêzên demokrasiyê hatiye kirin.

Di vî şerî de yê li dijî gelê Kurd û hêzên demokrasiyê, aliyê herî girîng şerê psîkolojîk e. Erdogan her roj dibêje ku, me evqasî li wan da û hejmaran dide. Erdogan her roj van nûçeyên derew dide û hewl dide moralê gelê Kurd xerab bike. Erdogan hewl dide bi vî şerê psîkolojîk re, krîza siyasî, civakî û ekonomîk ji ber çavan veşêre.

### ÇALAKIYA ÊLIHÊ HATE PÎROZKIRIN

Gerîla her roj bi çalakiyên cihê, derbeyan li artêşa Tirk dixe û berxwedaneke mezin nîşan dide. Gerîla herî dawîn li qada ku artêşa Tirk nehişt cenazeyê ciwanê ku xwe ji bo Rêbertiyê şewitandibû were veşartin, çalakiyeke mezin li dar xist û bersiveke tund da dewleta Tirk. Li Êlihê ya ku dewlet her roj zextên xwe zêde dike û êrîşî cenazeyan dike, em gerîlayên ku ev çalakî kirine û Fermandariya Eyaletê pîroz dikin û serkeftinê ji wan re dixwazin. Gerîla, gelên me, dostên wan û hemû hêzên demokrasiyê li ber xwe didin û têkoşîna xwe geştir dikin.

### EMRÊ AKP-MHP'Ê HINDIK MAYE

Faşîzma AKP-MHP'ê her roj bi şerê taybet û derewên psîkolojîk hewl dide emrê xwe dirêj bike lê divê bizanibe ku temenê wê hindik maye. Bi berxwedanê re ew ê krîza siyasî, leşkerî, ekonomîk kûrtir bibe û ew ê dawî li desthilatdariya AKP û MHP'ê were anîn. Li ser vî esasî em bang li gelê Kurd û dostên wan dikin ku li hemberî tifaqa faşîst a AKP û MHP'ê têkoşîna xwe geştir bikin."

# Şehîdên serhildanê hiştin ku berxwedan bi ser bikeve

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê bi daxuyaniyekê salvegera serhildanên 6-7-8'ê Cotmehê yên li bakurê Kurdistanê yên ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê ya li dijî DAIŞ'ê bîr anî û piştrast kir ku helwesta wan hişt ku asta têkoşînê li dijî çeteyên DAIŞ'ê bilindtir bibe û fikra azad û demokrasiyê belav bibe.

Di 6-7-8'ê Cotemeha sala 2014'an bi ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê li seranserî bakurê Kurdistanê û Tirkiyê gel daket qadan serhildan pêk anîn. Di van serhildanan de hêzên faşîst û noker yên dewleta Tirk êrîş birin ser serhildêran û di encamê de ji zêdeyî 50 kes şehîd bûn.

Berxwedana Kobanê 134 rojan bê navber ji aliyê şervanên YPG'ê û YPJ'ê ve li dijî çeteyên DAIŞ'ê dewam kir û di 26'ê Çileya 2015'an de bajar ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin.



Her wiha heta ku Kobanê rizgar bû rojane bi sedan welatiyên bakur li ser sînorê Kobanê nobeda piştgiriya berxwedanê girtin.

Girêdayî mijarê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê daxuyaniyek da. Daxuyanî ji aliyê hevseroka Desteya Karûbarên Derve ya kantona Kobanê Gulê Hesen ve hate xwendin. Her wiha nûner û endamên desteyên Rêveberiya Xweser jî amade bûn.

Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Terora cîhanî ku nûnertiya wê DAIŞ dike di 15'ê Îlona 2014'an de dest bi êrîşeke mezin li dijî herêma Kobanê kir. Ev êrîşa qirêj têkoşîna azadiyê ya Kurd armanc dikir û hewl da projeya azadiyê û demokrastiyê têk bibe.

Lê welatiyên her çar parçeyên Kurdistanê bi ruhekî seferberî li hemberî van êrîşan li ber xwe dan. Welatiyên Bakurê Kurdistanê û Anatoliyayê di 7'ê Cotmeha 2014'an de daketin kolanan û êrîşên li dijî Kobanê şermezar kirin. Her wiha dayîkan bi dengekî bilind li ser sînor qîriyan û gotin ku Kobanê ne bi tena xwe ye û ew ti carî dest ji Kobanê bernadin.

Welatiyan bi bedena xwe dîwarekî parastinê li ser sînor ava kirin da ku rê li pêşiya derbasbûna çeteyan a Kobanê bigirin. Di çalakiyên welatiyan de li gelek bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de gelek ciwan ku beşdarî xwepêşandanên piştgiriya berxwedana Kobanê bibûn ji aliyê dewleta Tirk ve hatin kuştin.Berxwedana Kobanê ji giştî cîhanê re piştrast kir ku biratiya gelan ti carî nahê têkşikandin. Em weke welatiyên Kobanê û endamên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Firatê helwesta ku Bakurê Kurdistanê nîşan daye silav dikin û helwesta wan hişt ku çarçoveya berxwedana li dijî terorê were guhertin û asta têkoşînê were bilindkirin."



## TÎP li gelên Tirkiyeyê pîroz be

Tayîp TEMEL

HDP li Tirkiyeyê îspat kir ku di navbera hêzên çepgir, sosyalîst ango muxalîf de çiqas nêrînên cuda hebin jî, ew dikarin mil bi milê hev û di bin heman sîwanê de ji bo azadiya gel têkoşînê bimeşînin. Dema mirov li hizr û nêrînên cuda yên hêzên sosyalîst û çepgir ên Tirkiyeyê mêze dike, wê demê mirov fêm dike ku HDP ji bo yekitiya Tevgera Siyasî ya Kurd û wan hêzan mûcîzeyek e.

Dema HDP di sala 2013'an de hat damezirandin û hevserokatiya wê partiyê Ertugrul Kurkçu û Sebahat Tuncel girt ser milên xwe, piraniya rêveberên wê jî di nav de gelek kesan bawer nedikir ku ew partî dê bibe navenda muxalefeta Tirkiyeyê û kêm kesan bawer dikir ku dê benda ji sedê 10 derbas bike.

Hem di encama mudaxeleyên rast ên Ocalan de hem jî bi bandora pêvajoya çareseriyê ya ku bi însiyatîfa wî dest pê kiribû, HDP di demek kin de li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê mîna stêrkek geş biriqî.

Tê zanîn ku cara ewil bi tevlibûna nûnerên gelek partiyên cuda li Tirkiyeyê partiyek çepgir, sosyalîst, welatparêz û kedkar hat avakirin. Pêkhateyên HDP'ê yên ewil; Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP – Pişt re bû DBP), Partiya Sosyalîstên Şoreşger, Partiya Sosyalîstên Bindest, Partiya Avakirina Nû ya Sosyalîst, Partiya Keskan û Partiya Pêşeroja Çep bû.

Pişt re jî bereya muxalefetê ya HDP'ê her ku çû berfirehtir bû. Gelek sazî, dezgeh û rêxistinên ku li derveyî HDP mabûn hem di çalakî û berxwedanê de hem jî di hilbijartinan de li ser pîvanên diyarkirî tifaq pê re çêkir. Ango ji aliyekê ve pêkhateyên HDP ava kiribûn, li aliyê din jî gelek hêz û saziyên ku bi hiqûqa tifaqê mil dabûn HDP'ê peyda bûn.

Ev hevgirtin û piştgiriya Tevgera Siyasî ya Kurd û hêzên çepgir û sosyalîst ên Tirkiyeyê di hilbijartina 24'ê Hezîranê de gihişt merheleyek nû. Hem ji pêkhateyên HDP'ê hem jî ji hêzên tifaqê gelek kes kesayetên girîng bûn bernamzetên parlementeriyê û piraniya wan jî hatin hilbijartin. Ji kesên bi tifaqê bûne parlementer du ji wan jî Erkan Baş û Bariş Atay in.

Erkan Baş mîna şoreşgerekî wêrek ji destpêkê heta niha mil daye têkoşîna azadiya gelê kurd. Lê her tim jî li kevneşopiya xwe ya siyasî ku digihije Mustafa Suphî û Behîce Boran xwedî derketiye. Bariş Atay jî wekî hunermendekî muxalîf, ereb û her wiha dostê gelê kurd ji heman kevneşopiyê tê.

Van hevalan di dema herî zor de mil daye têkoşîna azadiyê ya gelê kurd. Di hilbijartina parlementeriyê de elbet dengên gelê kurd diyarker bûn. Lê bi tevlibûna wan a HDP'ê jî sînerjiyek cuda derket holê lewre berê dengên gelek derdorên cuda dan HDP'ê.

Êdî ew dê bi nasnameya xwe ya Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TÎP) rêhevaltiya xwe ya bi şoreşgerên Kurdistanî re bidomînin.

Ya ku dikeve berê me ew e ku em bi her awayî vê rêhevaltî û dostaniyê mezintir bikin. TÎP li Tirkiyeyê pîroz be!



# MŞD'ê banga tevlîbûna çalakiyan kir

**Meclîsa Şengalê ya Derveyî welat têkildarî salvegera Komploya 9'ê Cotmehê daxuyaniyeke nivîskî Komploya 9'ê Cotmehê şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyan li hemû kesan kir. MŞD'ê wiha got, "Li girava Îmralî tecrîdeke dijmirovahiyê li dijî Rêber Apo heye. Ji bo şikandina tecrîdê em bang li tevayî Kurdistanî, gelê Êzidî û dostan dikin ku beşdarî çalakiyan bibin."**

Meclîsa Şengalê ya Derveyî welat Komploya 9'ê Cotmehê şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyan li Kurdistanî û hemû kesan kir.

Meclîsa Şengalê ya Derveyî welat têkildarî salvegera Komploya 9'ê Cotmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand. MŞD'ê hêzên komploger şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyan li Kurdistanî û hemû kesan kir.

MŞD'ê di daxuyaniyê de ev tişt parve kir;

"Em di serî de komploya li dijî Rêber Apo bi tundî şermezar dikin. Komploya navnetewî di kesayeta Rêber Apo de li dijî tevgera azadî, gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn pêk hat. Hêzên navnetewî ji bo ku li Rojhilata Navîn hegemoniya xwe mayînde bikin bi komployekê Rêber Apo dîl girtin.



Civaka Êzidî piştî fermana 73'an bi felsefe û paradîgmaya Rêber Apo dîroka Êzdatiyê ji nû ve nivîsand. Li pêşiya çavên cîhanê xwestin bi destê DAÎŞ'ê civaka Êdizî tune bikin lê ji ber ku Êzdatiyê li ser pradîgmaya Rêber Apo xwe birêxistin kir planên hêzên komploger vale derxistin. Paradîgmaya Rêber Apo hêvîya hemû gelên bindest yên Rojhilata Navîn e.

Li girava Îmralî tecrîdeke dijmirovahiyê li dijî Rêber Apo heye. Ji bo şikandina tecrîdê em bang li tevayî Kurdistanî, gelê Êzidî û dostan dikin ku beşdarî çalakiyan bibin û di salvegera komployê de dakevin qadan. Em bang li CPT û Konseya Ewropa dikin ku erka xwe pêk bînin li dijî tecrîdê bikevin nava tevgerê."

# Sadr ji bo hukûmeta nû 6 şert danî



Serokê Tevgera Şîî Mûqteda El Sadr ji bo hikûmeta nû ya Iraqê 6 şert diyar kir. Sadr daxwaz kir ku Wezareta Parastin, Karê Navxweyî û Ewlehî rasterast girêdayî Serokwezîr bin.

Serokê Tevgera Şîî Sadr Mûqteder el Sadr daxuyanî da û wiha got; "Meqamên ku di bin kontrola dewleta kûr de ne, divê li gorî mekanîzmaya yasa û mentiqê werin rawestandin."

Şertên ku Sadr ji bo hikûmeta nû dayî diyarkirin wiha ne;

"Divê wezaretên navxweyî û parastin û saziyên ewlehiyê rasterast di bin kontrola Serokwezîr de bin. Wezîr ji zextên partiyên siyasî dûr bikevin û ji aliyê serokwezîr ve werin hilbijartin. Meqamên di asta wezaretê de yên ku beriya niha jî aliyê dewleta kûr ve hatin kontrolkirin li gorî mekanîzmaya yasa û mentiqê werin rawestandin. Divê pêşiya kesên profesyonel û bi qabiliyet were vekirin. Ji bo parastina rûmeta dewletê divê şertên giran bên diyarkirin. Divê hinek meqamên hesas yên bûyê wesîleya reformê, di bin kontrola serokwezîr de be û komîsyonên li parlamentoyê li gorî berjewendiyên gel werin diyarkirin."

Li Parlamentoya Iraqê sêşema borî Berhem Salih ji bo Serokkomariya Iraqê hatibû hilbijartin Salih Adil Abdulmehdî ji bo avakirina hikumeta nû erkdar kiribû. Divê Abdulmedî di nava 15 rojan de kabîneyê ava bike.

# Li Endonezyayê hêjmara miriyan gihişt nêzî 1700 kes

Li girava Sûlawesî ya Endonezyayê piştî erdheja bi pileya 7.5, tsûnamî çêbibû û hejmara windayan her ku diçe zêde dibe. Heta niha nêzî 1700 kes mirine û li bajarê Palû jî zêdetirî hezar kes winda ne.

Li gorî bîlançoya fermî ya erdhej û tsûnamiya 28'ê Îlonê ya li girava Sûlawesî ya Endonezyayê herî kêm 1649 kes mirin.

Tê texmînkirin ku li bajarê Palû yê nifûsa wê 350 hezar û li peravên rojavayê girava Sûlawesî ye zêdetirî 1000 kes winda ne. Li Palûyê taxên Petobo û Balaroa hilweşiyan û hema bêje ji nexşeyê hatiye jêbirin.

Her ku diçe hêviyên rizgarkirina mirovên zindî tune dibe, heta niha rayedaran xebatên lêgerînê nedane sekinandin. Tîmên rizgarkirinê bi fikar in ku heta niha gelek kes di bin xirbeyan de mabin.

Wezareta Ewlehiyê got ku herêmên herî zêde bandor bûyîn divê veguherînin gorên komî û werin pîroz kirin.

Bi hezaran mirov bajarê Palû diterikînin, nexweşxane tijî bûn û pêdiviyên tedawiyê jî kêm in. Ji ber van sedeman birîndar ji bo bajarên cîran tênê şandin.

Netewên Yekbûyî roja Înê daxuyanî da û ragihand ku ji bo xebatên alîkariyê plana 50.5 mîlyar dolar xistine dewrê.



# Armanca komployê kûrkirina krîza Rojhilata Navîn bû

Meclîsa Kantona Efrînê ya li Şehba'yê bi boneya 20'emîn salvegera komploya navnetewî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi daxuyaniyekê komplo şermezar kir.

Daxuyaniya Meclîsa Kantona Efrînê bi zimanên Erebî, Kurdî û Îngilizî hatin xwendin. Bi dehan welatiyên Efrînê yên li kampa Serdemê û endamên saziyên sivîl û mamoste beşdarî çalakiyê bûn.

Di daxuyaniyê de komploya navnetewî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tecrîdkirina wî bi tundî hate şermezarkirin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku armanc ji komployê ew e ku çareseriya siyasî û demokrasî li herêma Rojhilata Navîn pêk neyê da ku hêzên hegomon dagirkeriya xwe li herêmê berdewam bikin.

Di daxuyaniyê de hate destnîşan kirin ku faşîzma Tirkiyê hovîtiya xwe li dijî gelê Kurd didomîne û hewl dide demografiya herêmên Kurdan biguherîne.

Di daxuyaniyê de behsa bexwedana Serdemê ya herêma Efrînê hate kirin û hat diyar kirin ku welatiyên Efrînê wê heta dawî berxwedana xwe bidomînin û wiha hat gotin,"artêşa Tirk û komên çete yên girêdayî wê hovîtiya xwe li dijî welatiyên Efrînê bi hemû rêbazên qirêj didomînin û mal û milkên welatiyên Efrînê talan dikin."

Di dawiya daxuyaniyê de bêdengiya civaka navnetewî li hemberî destdirêjiyên artêşa Tirk û komên çete li dijî herêma Efrînê û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tundî hate şermezar kirin û wiha bi dawî bû: "Em soz didin gelê xwe ku heta herêma Efrînê rizgar dibe û Rêber Ocalan azad dibe em ê asta têkoşîna xwe bilind bikin."





## Dostaniya bi endamên FETO re

Burhan ERDEM

Li îstasyoneke Brukselê yekî ji min bi Tirkî rê pirsî. Pêşiyê bi tirsekê, weke şokebûyî, bi gavekê paşde çûm. Min hewl da ez jê bi dûr bikevim. Ez sedema tirs û şoka xwe nizanim, lê belkî wî famkiribe. Bi Tirkiyeke xwenede diaxivî. Bi lêborîneke ji dema Osmaniyan mayî got, wî di trênê de bihîstiye ku ez bi Tirkî axivîme, ji ber wê hatiye cem min. Ji bajerekî ji Vlandrenê hatibû û diviyabû bi Metroyê çûbiya nexweşxaneyê. Min wî bir heta rawestgehê û rê bi ber xist.

Di çend deqeyên em bi hev re man de, weke Tirkên li Ewrûpayê dikin, tevnegeriyabû. Gotina wan a pêşiyê ku dipirsin; Turk musun? An jî; nerelîsîn hemşerîm? Ji devê wî mirovî derneketibû ku nebîhistina vê yekê li cem min, jê re bûbû sedema hurmetê. Em wan mirovên han ku di salên `80yî û `90 de gelekî ji wan reviyayî –û gelekî jî ketine destên wan-, polîsên sivîl di cih de nasdikin. Ji polîsbûna wî mirovî jî, ez emîn bûm. Min ji çend hevalên xwe re bahsa vê serpêhatiyê kir. Wan jî ji min re qala yên xwe kir. Bruksel bi endamên tevgera Fethullah Gulen tijî bûye. Çend nasên min ên çepgirên Tirk hene ku vê dawiyê sirgûn bûne. Vana bi hin endamên wan re têkeliyeke li ser dostaniyê jî pêşxistine. Polîsên berê û îşkencexwarên berê, herdû jî li Tirkiyeyê terorîst…

Beriya demekê bû, xwendina nûçeyeke derbarê endameke tevgera Fethullah Gulen de min gelekî xemgîn kiribû. Ayşe Ogretmen a wan jî hebûye. Wê û hevserê wê bi fermanên Erdogan ji kar diavêjin. Ji ber doza derbarê xwe de, mecbûrî koçê dibin. Xwe li çemê Merîçê dixin. Ayşe Ogretmen û du zarokên xwe difetisin. Me kêm hay ji wan çêdibe. Lê bi mexdûrbûneke mezin re rû bi rû ne. Ên xwe gihandine Ewrûpayê jî, ji xwe ditirsin. Vana xwe nêzî Tirkên din nakin. Lewra gelek mirovên wan ên payebilind, ji aliyê ajanên Erdogan û Ergenekoniyan ve hatine revandin.

Ême, em kurd û çepgir ev demeke dirêj e fêrî kirinên dijmirovî yên li hemberî xwe bûne. Lê ev mirov cara yekem e, bûne mexdûr. Cara pêşîne ew hatine girtin, îşkece li wan hatiye kirin, taciz û tecawiz dîtine. Ji gişan jî girantir, cara pêşîn e, ew ketine ser riya sirgûna ji welêt û bûyina pênaber. Yên derketine xwe li gorî yên hatine girtin bi şans dibînin. Lê ewê piştî salan fambikin ku, tu şans û siûda wan tunebûye. Li vêderê ew di binya sifirê de ne. Ew jî weke me kurdên li diasporayê, bi pereyên sosyalê ku dewlet li wan dinêre dest bi jiyana li vêderê dikin. Me kurdan piştî perê sosyalê dest bi karê donerê kir. Lê xuyaye ewê ji me zîrektir bin.